



Di Kurmancî De Cotepeyv û Cureyên Wan (The Doublings In Kurdish Language and Its Variations)

M. Zahir ERTEKİN¹, Zafer AÇAR²

Kurte

Di zimanan de hin bêje hene ku ji bo ku vegotinê bihêztir bikin û wateya îfadeyê xurt bikin bi bêjeyên wekî xwe, nêzî xwe yan jî dijberî xwe re tên bikaranîn. Ev cure dibe ku her zimanî de hebe û li gorî çêna zimanê xwe xwediyê awayên cuda be. Bêjeyên ku gava bi hev re hatin bikaranîn destekê didin hev û wateya îfadeyê xurt dikin ên wekî; ‘mal û milk’, ‘dar û ber’, ‘kul û derd’, ‘cil û berg’, ‘rast-best’..., dîsa ên hevedudanî, wekî; ‘serobino’, ‘nanoziko’, ‘kelogirî’, ‘helkehelk’, ‘kelekel’ û hwd.

Di kurmancî de ji van bêjeyan re cotepeyv tê gotin ku em ê di vê xebata xwe de ser vê cureyê bisekinin. Herwiha em ê ji edebiyata klasîk, ya nûjen û ya gel jî mînakên van bêjeyan bidin.

Peyvên Sereke: cotepeyv, ducarî, nêzdeng, cotepeyvên hemwate

Abstract

In a language, there are some words called doublings that are used in order to strengthen, consolidate or make the meaning effective by using synonyms, antonyms, homonym or meaning-related words. It is highly likely that these kinds of words can be found in any language and shaped according to the characteristics of that language.

1 Yrd. Doç. Dr. M. Zahir Ertekin, Bingöl Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı Öğretim Üyesi.
zahirertekin@hotmail.com

2 Xwendevanê Mastira Ziman û Wêjeya Kurdî, Enstituya Zimanên Zindî, Zanîngeha Bîngolê.

In this study, we will especially focus on the types and features of doublings that are called ‘cotepeyv’ in Kurdish Kurmanji dialect by giving examples from Classical Kurdish Literature, Modern Kurdish Literature, and Kurdish Folk Literature.

Keywords: Doublings, homonym doublings, repetition

Destpêk

Zimane kurdi erdekî beyar e zahf kêm xebat li ser hatine kirin. Bo vê yekê xezîneyeke gelek dewlemende ji bo lêkolîneran.

Belê bêguman îro berhemên ku bi kurdî hatine nivîsandinçendî kurdî di hundirê xwe de dihevin? Yan berhemên ku tîn nivîsin gelo herî zêde bi çend bêjeyan derdikevin qada weşanê? Eger bersiv na be gelo çima? Têkiliya vê yekê bi kêmasiya kurdî ve girêdayî ye an bi nivîskarên kurdî? Belê divê ev pirsên jor yek bi yek bêne bersivandin û li ser van mijaran xebatên berfireh bên kirin. Bêguman mijara gotara me ne ev e. Lê teqez têkiliya xwe bi van mijaran tevan jî heye. Lewra carna bi zanebûn carna bi nezanî haya me ji kêrahiya kurdî tune ye. Carna jî em dewlemendiya zimanê kurdî tevî bikar jî tînin, hay jê nîn in. Loma divê xebat bi rêk û pêk birijîn ser nivîsê û li ber çavan bên raxistin.

Îja di kurdî de mijareke girîng heye ku di gotin û nivîsê de ji bo xurtkirina wateyê tê bikaranîn. Carna bêyî hemdê xwe em di nava galgal û gotûbêja rojane de jî bikartînin. Di nivîsê de bêtir û bi baldarî hatiye/tê bikaranîn. Em ê di vê nivîsê de li ser vê “tekîd” ê rawestin. Di gotina rojane de, di nivîsên edebî de, di çapemeniyê de û di edebiyata klasîk de bi mînakan em ê li ser vê xurtiya “tekîd” ê bisekinin. Bi cûre û mînakan em ê gotarê şênber û dewlemend bikin. Di encamê de em ê cî û bandora vê mijarê li ser kurdî binirxînin. Ev cureya ku bûye babeta nivîsa me ‘cotepeyv’ in ku di kurmancî de hem di axaftinê de hem di nivîsandinê de bi berfirehî tîn bikaranîn.

Cotepeyv

Ji bo ku vegotin bi derbtir û xurttir bibe du peyv tîn bal hevdu û dibin cotepeyv.³Di axaftina rojane de ji bo ku axaftin bihêz be ev cure peyv tîn bikaranîn. Cotepeyv dikarin ji bêjeyên hemwate, dijwate, nêzwate pêk werin, herwiha dikarin bi alîkariya gihanek û navbendan bikevin şiklên nû an jî carna di navbera herdu bêjeyan de bi xêzekekê jî ev bêje bên bikaranîn û vegotinê bitesîr bikin. Em ê ji aliyê wateyê û ji aliyê şiklî ve li ser cureyên wan bisekinin.

3 Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, weş: Belkî, Stenbol, 2012. r. 39

Cureyên Cotepeyvan

Di kurmancî de cureyên cotepeyvan ji aliyê wateyê û ji aliyê şiklî ve dibin du bir û her birek di nav xwe de dibe çend cureyan.

A. Ji Aliyê Wateyê ve

a. Cotepeyvên Hemwate

Ev cure cotepeyv bi du bêjeyên hemwate pêk tên ku yek ji ya din re dibe destek. Li gorî Samî Tan ev ji bandora erebî tê. Ji ber ku di medreseyan de peyveke kurdî digel hemwateya wê ya erebî hatiye bikaranîn.⁴ Niha jî em li ser mînakên rawestînin:

‘zar û ziman’, ‘rast-best’, ‘kevir û ber’, ‘eşq û muhbet’, ‘rih û can’ ûww.

Wekî ji mînakên jî diyar dibe, herdu bêje jî heman wateyê didin ku yek dika-re di şûna ya din de bê bikaranîn.

b. Cotepeyvên Dijwate

Bi du bêjeyên dijwate têne pê ku bi vê îfade dikeve nav du sînorên dijberî hev. Mînak:

‘Şev û roj’, ‘kar û zirar’, ‘qenc-xirab’, ‘rast-derew’, ‘xêr û şer’, ‘hebe-tunebe’ û ww.

Pirî caran jî bi dubarekirina du peyvên dijwate mirov dixwaze tişteki texmînî bibêje:

‘Zû û dereng’, ‘kêm-zêde’,...⁵

c. Cotepeyvên Nêzwate

Bi du bêjeyên nêzwate pêk tên ku ew bêje ji aliyê wateyê ve nêzîkî hev in û yek bi ya din sînorê wateya xwe firehtir dike. Mînak:

‘Çiya û banî’, ‘çol û çiya’, ‘nas û dost’, ‘heval û hogir’, ‘kevir û kuç’, ‘lez û bez’ û ww.

Carna dikare bêjeyek ji nav sînorê bêjeya dû xwe de jî bê fêmkirin. Mînak:

‘Gul û giya’, ‘der û dor’, ‘sir û serma’ û ww.

d. Cotepeyvên Têkilhev

Hin cotepeyv jî hene ku bêjeyên wan gava bi hev re hatin bikaranîn hev temam dikin û heryek xwe wekî perçeyatevahiyê nîşan dike. Mînak:

‘dê û bav’, ‘kal û pîr’, ‘jin û mêr’, ‘rez û pez’, ‘bûk û zava’ û ww.

Wekî ji mînakên jî diyar dibe ‘dê û bav=dêwbav yanî ebeweyn, kal û pîr=ced, jin û mêr=zewac an jî malbat, rez û pez=mal, bûk û zava=zewac û malbat’ê diyar dikin.

4 Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, weş: Enstîtuya Kurdî, Stenbol, 2011, r. 80.

5 Tan, h.b. r. 80.

B. Ji Aliyê Şiklî ve

a. Cotepeyvên Ducarî

Ev cure cotepeyv bi du bêjeyên hev deng û hemwate ve tên bikaranîn. Mînak:

‘Hêdî hêdî’, ‘car car’, ‘zû zû’, ‘tim û tim’, ‘bere bere’, ‘her û her’ û ww.

Li aliyekî din di kurmancî de hin ajel û giya hene ku navên wan bi cotepeyvên hatine danîn. Ev cotepeyv bi piranî bi ducarîbûna heman peyvê çêbûne yan jî bi tevî paşgira ‘-ok’, ‘-ik’, ‘-îk’, ‘-k’ ve hatine pê. Mînak:

‘Legleg’, ‘çileçile’, ‘şevşevok’, ‘perperik’, ‘qumqumok’, ‘xapxapok’, ‘fatfatok’, ‘pînpînik’, ‘gezgezok’, ‘lavlavk’, ‘xaşxaş’, ‘kirkirk’ û ww.

Dîsa vê cureyê em di navên hin tiştan de jî dibînin. Mînak:

‘pîrpîrk’, ‘xumxum’, ‘şeqşeqok’, ‘xişxişok’, ‘vizvizok’ û ww.

Herwiha hin lêker jî bi ducariya peyvê ve yan jî bi cotepeyv û lêkera ‘kirin’ê ve hatine pê. Mînak:

‘gîjgîjîn/gîjgîjandin’, ‘qîlqîlîn’, ‘xulxulîn’, ‘milmilîn’, ‘galegal kirin’, ‘mirremirr kirin’, ‘qîjeqîj kirin’ û ww.

b. Cotepeyvên Nêzdeng

Ev du cure ne:

1. Ev cure; ji du bêjeyan pêk tên ku yek ji wan biwate yek jiwan bêwate ye û bi piranî bêjeya duwem bi tîpa ‘m’ yê dest pê dike. Tîpa ‘m’ ducarîbûnê xirab dike û bêjeya duwem bêwate dike. Mînak:

‘Tişt-mişt’, ‘heval û meval’, ‘dar-mar’, ‘xan û man’, ‘pez-mez’, ‘kel-mel’ û ww.

Wekî li jor tê dîtin ku bêjeya serî biwate ya dû jî bêwate ye û herdu nêzdengê hev in. Wekî van hin cotepeyv hene ku bêjeya serî bêwate-di hin mînakan de biwate- û ya dawî biwate ye ku bi piranî nêzdengê hevin. Mînak;

‘kilîkor’⁶, ‘xirûxalî’, ‘tu yî tune’, ‘rip î reş’, ‘xilîxar’, ‘şil î şet’ û ww.

Di vê cureyê de jî herdu bêje jî bêwate ne lê gava digihijin hev temsîla tiştêkî dikin û di listikên zarokan de û carna di zûgotinok an mamikan de jî tên dîtin herwiha di hin bikaranînan de jî wekî îfadeyên argoyî jî dikarin bên fêmkirin. Mînak:

‘çiz û viz’, ‘çirt û virt’, ‘êkê mêkê’, ‘qilopilo’, ‘tiroviro’ û ww.

c. Cotepeyvên Hevedudanî

Ev cure jî dîsa ji du bêjeyan pêk tên û herdu bêje yan bi gihaneka ‘û’-ku gelek caran veduguhere tîpa ‘o’ yê- yan bi navbendekê digihijin hev û dibin hevedudanî. Mînak:

6 Di vê derê de mînakên me hevedudanî ne lê carna ev bêje ji hev cuda jî tên nivîsandin.

‘şilfûtazî’, ‘xirûxalî’, ‘serobino’, ‘kelogirî’, ‘çeporasto’, ‘kelekel’, kezîkur, ‘qîjeqîj’, ‘kalemêr’, ‘kilîkor’ û ww.

Wekî ku ji mînakên jor jî diyar dibe cotepeyvên hevedudanî dikarin bi hemû cureyan jî teşe bigirin wekî; bêjeya pêşîn bêwate ya duwem biwate be, mînak; ‘şilfûtazî’, ‘xirûxalî’, ‘rip û rast’ û ww. Dikare du bêjeyên dijwate bi hev ve bike, mînak; ‘serobino’, ‘çeporasto’, ‘sarogerm’, ‘danûstan’ û ww. Dîsa dikare bêjeyan bi navbendekî ducarî bike, mînak; ‘kelekel’, ‘gurmegurm’, ‘zarezar’, ‘tîqetîq’ û ww. Û dîsa dikare bêjeyên nêzwate bi navbendekî bi hev ve bike, mînak; ‘kelogirî’, ‘şeveres’ û ww.

Li vê derê divê em behsa dengên biolan yên însan û heywanan û herwiha yên li sirûştê tê bihîstin bikin ku ew jî bi piranî bi alîkariya navbendekê bi cotepeyvyan çêdibin yanî bêjeyek bi tevî navbendekê ve ducarî dibe û wisa ew deng tên der. Mînak:

‘çelpeçelp’, ‘çiveçiv’, ‘firefir’, ‘barebar’, ‘kazekaz’, ‘gurmegurm’, ‘hîrehîr’, ‘tîqetîq’, ‘qeqeq’, ‘reqereq’, ‘hekehek’, ‘nalenal’ û ww.

Piştî van agahiyan niha jî em ji hin berhemên edebiyata kurdî û ya klasîk û nûjen çend nimûneyan li ser babeta xwe bidin û mijara xwe biherin serî.

Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Bikaranîna Cotepeyvyan

Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de ev cure gelekî hatiye bikaranîn ku em ê ji çend berhemên mînakê bidin. Di Mewlûdê de Melayê Bateyî di gelek ciyan de cotepeyv bi kar anîne. Mînak:

Hate Evdilmuttalîb vê seatê

*Kir tedarîk **kar û barê** dawetê*

Dîsa di ciyekî din de:

Asîmanê bê sitûn wî kir pedîd

*Sûretê ba **xal û xet** wî aferîd*

Di dîsgotinên Mewlûdê de jî em dîsa cotepeyvyan dibînin:

Ger divêtin hûn jî narê bin necat

*Bi **işq û şewqek** hûn bibêjin esselat⁸*

Melayê Cizîrî jî di *Dîwana* xwe de ev îfade wiha bi kar anîne:

Hê di ber qalûbelayê belku ev ‘alem nebû

***Çerx û dewran** dewrê gerdûn gunbedê mîna nebû*

7 Melayê Bateyî, *Mewlûd*, Dersaadet 1313/1895, r.20. (Bi destûra wezaretê marîfetê hatiye çapkirin)

8 Bateyî, *Mewlûd*, r.4.

'Ers û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê
Husnê Heq bû istiwaê lamî'a 'işqê hebû

Nehtibûn hukmê sîfatan ew ji zatê lemyezel
'Aşiq û me'şûqîyek bûn şem' û hem perwanebû

Husn û hub zatê qedîm in lê cuda bûn ew ji yek
Lê niha ismê hudûsê hikmet û tefsîl we bû
...⁹

Dîsa di şî'ireke xwe ya din de Mela wiha dibêje:
Nergîzên şengî di mest in **çep û rast**
Saqiyan camî di dest in çep û rast

Rast û çep tên **ceger û sîne** kulab
'Er'erên şengî di mest in çep û rast'¹⁰

Wekî van beytên li jor Mela di gelek helbestên xwe de cotepeyv bi kar anîne. Dîsa Feqiyê Teyran jî di helbestên xwe de cotepeyv bi kar anîne. Çend Mînak:

Ey av û av ey av û av
*Ma tu bê **eşq û muhbetê***
***Mewc û pêlan** tavêy belav*
*Bê sekn û bê rahetê*¹¹

Dîsa di qesîdeya Şêxê Sen'an de Feqî di seranserê helbestê de gelek caran cotepeyv bi kar anîne ku wekî Mela ew jî hosteyê vê cureyê ye. Mînak:

...
*Pê xweş dibû sed **lal û şil***
*Pê rohn dibû ber **çav û dil***
*Pê rast dibû **dal û mudil***
Ê ku sirra Şêx vêketê

...¹²

Dîsa yek ji hosteyê bikaranîna cotepeyvvan Xanî ye ku di *Mem û Zîn*'ê de ew pîr zêde bi kar anîne. Çend mînak:

...
Ey metle'ê husnê işiqbazî
*Mehbûbê **heqîqî û mecazî***

9 Melayê Cizîrî, *Dîwan*, werger û latînzekirin: Osman Tunç, weş: Nûbihar, Stenbol, 2008, r. 458.

10 Cizîrî, h. b. r. 264.

11 *M. Xalid Sadîni Feqiyê Teyran*, weş: Nûbihar, Stenbol, 2003, r. 121.

12 Sadîni, h. b. r. 276.

...

*Me'şûq tu yî bi **fexr û naz î**
Aşiq tu yî lêki bêniyaz î*

...

*Ew **ruh û cesed** bi **cebr û îkrah**
Tezwîci biwîn bi emrê Ellah*

...

*Mewcûd e di wê **şehadet û xeyb**
Meşhûd di wê **siyadet û 'eyb***

...¹³

Dîsa yek ji Mewlûdên Kurmancî, Mewlûda M. Emîn Heyderî de ev mînakên babeta megelekî tên bikaranîn ku em jê perçekê li jêr nîşan bidin.

*Hemdê bê hed bo Xwedayê pir şerîf
Nûr û qûwwet daye ummeta de'îf
Ew Mûhemmed tacê **rusl û enbîyan**
Hem serekdarê **teqîyy û ewlîyan**
Navê Adem qet nebû hêj ew herî
Pir zemanek ew dima **şil û terî**
Eqd û mîsaq ê ji wan xwestî Rehîm
Nûh û Îbrahîm û Mûsa wan Kerîm
Tîrs û heybet ketye qelbê wî ji min
Xwestî 'efwa wan gunahê xwe ji min*

...¹⁴

Ji mînakên me yên li jor ên ji edebiyata klasîk jî nîşan didin ku helbestvanên klasîk di berhemên xwe de cotepeyv gelek bi kar anîne û pê wan hêz û bandor dane ser îfadeyên xwe. Niha jî ji Edebiyata Nûjen em ser çend mînakan rawestin.

Di Edebiyata Kurdî ya Nûjen de Hin Mînakên Cotepeyvan

*Heke min jina wî nedîta, min ê bigota ev jî yek ji wan zîlamên ku buhtanan dixê stûyê jinan û hemû **sûc û gunehê** xwe li jinan bar dîke.*

*Ji min bawer bike, zarokan ji ber **qîj û wîj** û pevçûnê wê ji malê bar kirin.¹⁵*

Di rûpeleke din ya heman berhema nivîskarî de:

*Her ku diçe dinya li min tengtir dibe, **der û dor** li min tengtir dibin.*

Dîsa di heman rûpelê de:

13 Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Çeviri ve Kavramsal Tahlil: Kadri Yıldırım, weş: Avesta, Stenbol 2010, r. 127, 128, 129.

14 Şex Muhemmed Emîn Heyderî, *Mewlûda Nebî*, Lîs, Stenbol, 2007, r.6.

15 Firat Cewerî, *Lehî*, Weşanên Nûdem, Stenbol 2011, r. 119-201.

*Ez ji hemû **kul û derdên** dinyayê, ji hemû **koşk û serayên** dinyayê dûr xistim.*¹⁶

Niha jî em ji berhemeke Cegerxwîn nimûneyekê bidin:

*Li her alî dinêrim **heyhey û şîn**
Kurên te tev dibazin: **Qîr û nalîn**
Wekî mi ew hemî bûne Cegerxwîn*¹⁷

Şikoyê Hesên jî di helbesta xwe ya navdar ‘Zimanê Kurdî’ de ev cure wiha bi kar anîne:

Zimanê Kurdî
*Bi **sêr û sur** e
Cewahir, durr e
Zimanê kurdî*

*Bi **xeml û rewş** e
Şîrîn û xweş e
Zimanê kurdî*

*Bi **xweş awaz** e
Letîf û naz e
Zimanê kurdî...*¹⁸

Piştî van mînakên jî Edebiyata gel –ji gotinên pêşiyên, jî biwêjan, jî mamik û cureyên din- jî em çend mînakên dikarin bidin.

Di Edebiyata Kurdî ya Gel de Bikaranîna Cotepeyvyan Gotinê pêşiyên

Di kurmancî de bikaranîna cotepeyvyan di hin gotinên pêşiyên de çawa tînan bikaranîn em çend mînakên bidin.

*Me bûk anî bi **lez û bez**, sivika malê dîsa ez.
Dizan ji dizan dizî **erd û ezman** lerizî.
Dê û dotê şer kirin bêaqilan bawer kirin.*

16 Cewerî, h. b. r. 176

17 Cegerxwîn, Sêwra Azadî, Weşanên Avesta, Stenbol 2002, r 40.

18 *Kurdî* 5, weş: MEB, Ankara, 2012, r. 110.

Galgala ket nav **dev û dirana**, wê bigere li **bajar û şaristana**.
 Dibêjin tu li rê **qeda û bela** li rê.
Hûrik hûrik dagire tûrik.

Biwêj

Di kurmançî de biwêj gelekî tê bikaranîn jixwewêji mînanan jî bê dîtin kudi edebiyata devkî de cotepeyv çiqas rêyeke bi bandor a bihêzkirina îfadeyê ye. Çend mînak:

Ji aş û başpeyvîn.
Şaşopaşo bûn.
Çeporasto lê rast bûn.
Serobino bûn.
 Agir li min barî **kevir kuçik** li te barî.
Ketindev-diranê xelkê.
Dil hinav tevê hev bûn.
Soromoro bûn.
Av-rizq tamam bûn.
 Xwe avêtina **dest û pêyan**.

Mamik

Cotepeyv di cureyên edebiyata devkî de gelek tê bikaranîn ku ji mamikan em dixwazin çend mînanan bidin.

Xişt mişt çû pişt derî rûnişt.



Mamikê min o

Ser hesîr e

Dawî dar e

Çiya û banî

Tîne xwar e

*Çi ye?*¹⁹



Mamikê min o

Teqoreqo

Kîncan dişo

*Çi ye?*²⁰



19 M. Xalid Sadîni, *Mamikên Kurmançî*, weş: Nûbihar, r. 27, Stenbol, 2011.

20 Sadîni, h. b. r. 33.

Mamikê min o
Kaniya li nizarî
Mîr û hakimî
Av jê vexwarî
*Çi ye?*²¹



Mamikê min o
Xeftan Bşînê heciya
Tep û rep jê weşiya
*Çi ye?*²²

Wekî ku ji mînanan diyar dibin di mamikan de jî cotepeyv tên bikaranîn û hêj em dikarin gelek mînanan bidin.

Encam

Di zimanan de bikaranîna cotepeyvyan yek ji riya bitesîrkirin û bihêzkirina vegotinê ye. Li gorî zimanan biguhere jî mimkun e ku di hemû zimanan de ev cure hebe û dikare li gorî zimanê xwe xwedî taybetiyên cuda be. Me li jor tesnîfa cotepeyvyan û mînakên wan da, lê ji bilî van dîsa cotepeyv hene ku wekî; yek erênî yek neyinî: ‘man neman’, ‘hatin nehatin’, ‘kirin nekirin’ û ww. dîsa yên bi alîkariya daçek û gihanekan tên çêkirin û ji du bêjeyan zêdetir in: ‘mil bi mil’, ‘dem bi dem’, ‘roj bi roj’ û ww. ‘bêje jî nebêje jî’, ‘were jî neyê jî’ û ww. ‘geh li vir geh li wir’, ‘geh diçe geh disekine’ û ww. ‘ji min re ji te re’, ‘ji vî ji wî’ û ww. Dîsawekî cureyeke din; yên jimarîn: ‘du-sê’ ‘çar-pênc’, ‘bîst-sî’ û ww., wekî cureyeke din cotepeyvên ravekî yên wekî; ‘kurê kuran’, ‘seyê (ji) seyan’, ‘mêrê mêran’ û ww... dikarin wekî mînakên cotepeyvyan bînin dan.

Di kurmancî de wekî ku me li jor mînakên wan dan cotepeyv curbecur in û hêz û dewlemendiya kurmancî diyar dikin. Hem ji aliye wateyê ve û hem jî ji aliye şiklî ve bi gelek awayan tên bikaranîn. Herwiha bi riya gihaneka ‘û’ û hin navbendên mîna ‘e’, ‘î’, ‘o’ dikarin bigihijin hev û bibin hevedudanî. Dîsa me di mînakên xwe de dît in kudi Edebiyata Kurdî de wekî ku di axaftinê de tên bikaranîn zêde zêde tên bikaranîn, xweser jî nivîskarên klasîk di berhemên xwe de ev bêje pir bi kar anîne.

Wekî dawî, cotepeyv gelek in ku me di xebata xwe de behsa hin ji wan kirin. Dibe ku li herêmên cuda formên cuda hebin û jimara wan gelek bin. Lê ya ku divê em ser rawestin ev e ku pîrbûn û curbecurbûna cotepeyvên kurmancî hêz û xurtiya kurmancî nîşan didin.

21 Sadînî, h.b. r. 33.

22 Sadînî, h.b. r. 35.

Çavkanî

- Aydoğan, İbrahim Seydo, *Guman-1*, weş: Lîs, Stenbol 2013.
- Baran, Bahoz, *Rêzimana Kurmancî*, weş: Belkî, Stenbol 2012.
- Bateyî, Melayê, *Mewlûd, Mewlûd*, Dersaadet 1313/1895.
- Cegerxwîn, Sêwra Azadî, *Weşanên Avesta*, Stenbol 2002.
- Cewerî, Firat, *Lehî*, *Weşanên Nûdem*, Stenbol 2011.
- Cizîrî, Melayê, *Dîwan*, werger û latînîzekirin: Osman Tunç, weş: Nûbihar, Stenbol 2008.
- Heyderî, M. Emîn, *Mewlûda Nebî*, Lîs, Stenbol 2007.
- Kurdî 5*, weş: MEB, Ankara 2012.
- Sadînî, M. Xalid, *Feqiyê Teyran*, weş: Nûbihar, Stenbol 2003.
- Tan, Sami, *Rêzimana Kurmancî*, weş: Enstîtuya Kurdî, Stenbol 2011.
- Xanî, Ehmedê, *Mem û Zîn*, Çeviri ve Kavramsal Tahlil: Kadri Yıldırım, weş: Avesta, Stenbol 2008.
- Sadînî, M. Xalid, *Mamikên Kurmancî*, weş: Nûbihar, Stenbol 2011.